

# Lîbralîzma nû û wergirtina xelet

**N: Kemal Gabrayîl**

**Wergêr: Sebîh Mihemed Hesên**

**H**eger bara pitira wan pirsyarên li rojhelat me dihêne kirin, li dor guherîn û çaksaziyê û bi taybetî li dor helwîstê me, ji lîbralîzma nû wekî dûmahiyê bo mêjûyê, xelet bin, helbet bersiv jê dê xelet bin, yan hema nabin? Bo nimûne:

-Heger lîbralîzm bo civakên rojavayî be, bo çî me rewşenbîrî û bi boçûnek taybet bi xwe ve nabe?

-Erê lîbralîzm bo civakên me yê rojhelatî bi kêr dihê?

-Erê jêderê çaksazî ya bi rastî... ma ne ji nav civakî bi xwe ye?

-Erê ma ew jî ne lîbralîzm e, her miletek bi mîkanîzmên xwe yê taybet û li dûv hizir û bîrên zorîna xelkî riya xwe ya taybet destnîşan bike?

-Erê miyanrewî (lîbralî) ne ewe tu bighê çarekirineka navîn ku hemû layan pê razî bibin û renga, têkelkirineka be, yan rêkeftinek be di navbera layanên ne wekhev de?

-Dê çawa miletê xwe bi serdagirtina rewşenbîrî ewa gefa nasnama me ya netewî dike, biparêzin?

-Dê çawa lîbralîzmê ji wan tiştên li dijî pîrensîbên ne gorên miletê me paqij bikin?

Tinê ev çend nimûnek bûn ji pirsyarên xelet ku bi riya wan em careseriya vî babetî dikin. Her wekî ev babete pêşniyareke li ser me hatiye sepandin ji layê hinde hêzên biyanî ve niyetên wan beramber me xerab in û hindêk ji me her çend dilê wan jî yê saxê bi dûv ketine ku şaristaniya rojavayî serên riya lê berz kirine, lewra wekî Totî û Meymonîka ewên ji bilî çavlêkirineka kore çî dîn nizanin, yê bizavê dikin devera Rojhelatî û Rojavayî bikin û nasnama wî bigurin.

Serbarê wê yekê ku me bawerî bi giringiya- belkî bi hetmiyeta-diyalog û li xwe zivirîne heye, da ku ji astenga rewşenbîrî derbaz bibin û divê jî berî şemendefêr me bihêle yekla bikin. Belê destpêkirin ji wê zemînê li gel wan xeletên jê çêdibin, dê encam komeka dê ya qeyrana be û li ser hemû astên madî û civakî û

rewşenbîrî, belkî diyalog bi xwe jî dê dibe parçek ji qeyranê ango li destpêkê mesel girêdaye bi dîtina dergehê dirust ve, çunkî ew bi tine gerentiye bi dîtina pirsyarên dirust yên ku divê em rûbirûbûna wan bikin û wê gavê jî dîtina bersivên dirust û yeklajer bo hilbijartinên me bo vê semtê yan semta he dê sanahîtir bikeve.

Bi sanahîkirineka xelet nîne, heger em miletên cîhanê bihêne ber çavên xwe ku yên bûne du pişk: pişka xweşî û berferehiyê û pişka hejarî û nexweşiyê. Heger em bi piştrastî miletên xwe bi danîne di nav pişka du yê de, paşî bi heman pişk rastiyê me biryar da heta hetayê nemîne di wê rewşê pîs de û me hemûya pê gengeşe û nakokî biryar da wan şewaz û rêbaza peyrew bikin yên me ve dughêzîne pişka dî ya cîhanê, ango ji hejarî û nexweşiyê ber bi xweşî û berferehiyê. Lewra divê li ser pêşwazîkirin û peyrewkirina van rêbaz û şewaza, li her gaveka bi dest me bikevin rêk bikevin, da piştî hingê danûstandina me li ser wê çendê be ka em çawa rewşa xwe lêk bidin û bi ser û ber bixin da nêzîkî wan bibin, wate vê çendê jî eve ye: Heger hemû serborên miroveyetiyê ji bo bi destveînana armanca pêdivî, wata vê çendê ewe ku peyrewkirina wê armanca me ye, neke em armanca wêne, yan hindekên hatine serdabirin û yên tepka bo me dikolin ji bo xizmetkirina biyaniya û yên lîbralîzmê li ser me disepînin.

Hilbijartinek heye divê em yekla bikin yan em xwe bi rewşt û tîtal û rewşenbîriya xwe ya her û herî ve bigrin, ku bi dirêjîya çerxa her xwe dubare dikin û dibine egerê hejarî û nexweşiyên me, yan jî armanca xwe bighêne ew pêşketina rewşa me ya nûke diguhre, rêk jî, her wekî serborên cîhanê selimandî, yeke ew jî lîbralîzme, zeîkirina wextî di dudilî û ne yeklayanîkirinê de, dê meselê bi zehmet lê bike, yan jî bi yek carî çê nabe.

Paşî dê pirsyar dirust eve be “erê em bi kêr lîbralîzme dihên”, wekî bawerî yekê bi xwe û miletê xwe.

Li ser astê piraktîkî jî bi cihînan gelek bi zehmete, hege nebêjin ya mistehîle, renga qunax bi qunqx mesele bihête encam dan, belê bi mercekî rijdî û dilsozî hebe beramber me û cîhan pêşkeftî de. Û her kêmasiyek di piraktîzekirina lîbralîzmê de wek berçav wergirtinekê bo nasname û taybetmendiya me dê bibe egerê yek ji van du encaman:

**Yek:** ji navbirina pirojê çaksaziyê hemiyê, heger xalên hatine piştguhavêtin ji lîbralîzmê serekî bin.

**Du:** bi destveînana serkeftineka sinordar, heger layenê hatine

piştguhveavêtin kême û layekî bin, paşî jî çî biyav namîne bo kêmkirina ewa dibêjinê rasenayeti û hevçerxayeti, yan çareyeka navîn ku hemû layen pê razî bibin, yan bi karîna xeleta mîkanîzmên dîmokrasiyê, ji bo encamdana komeka prosên jêbirin û komkirinên bîrkarî, ku bi riya wan prosa zorîna xelkê -ku di binert de di paşteftinê de- dê biryarê bide ka em li dûv kîjan rêbazê biçin, da careka dî jî ser ji nû ve û bo heta hetayê serborên xwe yê neserketî dubare bikin û da careka din jî ser ji nû xirxalî eşkera bikin wekî rijdbûneka debeng li ser hêrana bayî û eşkencedana kesayetiya xwe, li ser astê praktîkî jî ne yê xirabe em bi wê pêşteftina ku dibe bihê bicihînan razî bibin, ew jî li dûv dûrtirîn şiyanên xwe yê rêkeftinê li gel lîbralîzmê, ev çende jî ji ber yekê ku guhurîna navaroka sed der sed di destê me de nîne, belê bi mercekê ev helwîste ne rijdbûn be li ser cih de man û viyana paşteftina şaristanî be, belkî xwe dûrxistine ji mustehîlî û li gel wê yekê jî ev çende hizra me -wek helwîstekê bineretî- beramberî wî mustehîlî nerawistîne.

Çî delîve nînin, em hizra xwe di berhemînanana rêbaza xuya taybet de bikin, çunkî rêbaza me ewe ya nûke em tê de û berdeambûn li ser bizavên bê dumahî, rijdbûne li ser şikestinên hêjta û razîbûne li ser jêwarê xwe yê paşteftî û rezîl, belê heger em wê çendê bi eşkereyî rabigehînin baştîre ji wê çendê em xwe bixwepînin ku em yê ber bi pêş biçin. Belê bi rastî em di bazînekê vala de dizivrin û livînên me gorên me kûrtir lê dikin.

Bi vê rêbazê dê hemû pirsîyarên xelet şikestinê bixun, ku me hindêk ji wan li destpêka vê gotarê diyar kiribûn û dê bo me eşkere be ku bara pitira diyolagên li dor çaksazî û lîbralîzmê dihêne encamdan ku yek ji wan layenan şopperêsî ayînî û demargîrbûn danûstandinên ji derveyî babetî bûn ji ber ku mesele ji rexê xelet dihate baskirin wekî nexweşî evê li wî dermanî digere yê bi kêr hesta wî ya pîroza tamkirinê bihê û kanî pêkhat û naveroka wan dermanan çawan li gel wan tiştan digunce yê ku destûrî heye biçine di nav zîkê wî de. Ev li şûna wê çendê ku fere xwe berhev bike bo pêgîrîkirinê bi rênmayên derman xwarinê bê xemet misogerkirina mifayî! Vêca heger rabirdû li ber me pîroztir be ji paşerojê û babkal û babîr fertirbin bo çavdanê û heger em baweriyê bihînin yan danpêdanê bikin yan rijd bin li ser wê çendê ku em hindêk bûnewerin asêne û li dijî guhurîne vê gave dê me maf hebe meseleyê hemûyên ret bikin jor û şikeftên xwe li xwe bigrin li hêviya çarenivîsê xwe, ewê dibe zû bihê yan çendekê giro bibe.